



Vaksîna xurtkirinê bi vaksînê mRNA (Pfizer/BioNTech, Moderna)

Derziya mRNA dijî kovîd-19a giran ya razana li nexweşxaneyê baş diparêze. Lê, ev parastina ewlebûna bingehîn bi hebûna cureyên vayrusê yê heytî zû kêmtir dibe. Ji ber vê sedemê em bo kesên 12 salî mezintir ji her kesî re tewsiye dikin ku derziya xurtkirinê lêdin.

Mebest ji vaksîna xurtkirinê çi ye?

Vaksîna xurtkirinê pergala ewlebûnê ya patojênê tîne bîra mirov. Derziya xurtbûnê bo pergala ewle ya patojênê ye. Parastina derzîlêdanê dijî nexweşiyên giran dîsan kêmtir û dirêj dibe.

Zanîna vêya girîng e: Bi hebûna cureyên vayrusê yê heytî, derzîlêdan pir kêmtir we diparêze û we hinekî ji tûşbûnê û nexweşiya negiran diparêze. Tevî ku derziyê li xwe bidin, hûn dikarin bi kovîd-19ê bikevin.

Vaksîna xurtkirinê li kê tewsiye dibe?

Ji bo her kesê 12 salî û mezintir derziya xurtkirinê tê tewsiyekirin.

- Ev tewsiye bi taybet bo wan kesan e ku bi awayê taybet ber metirsiya ji koronayê ne:
- Kesên 65 salî û jortir
- Kesên 16 salî û pîrtir bi nexweşiyên demdirêj¹
- Jinên ducanî

Kingê divê vaksîna xurtkirinê were lêdan?

Derziya xurtkirinê ji 4 mehan piştî ewlebûna tam a bingehîn bi derziya mRNA tê tewsiyekirin. Ewlebûna bingehîn a tam piştî van heye:

- du doz vaksîna mRNA vaccine; yan
- tûşbûneke erêbûyî bi koronavayrusê + dozeke vaksînê ya mRNA herî kêmtir 4 hefteyan wêdetir (bêyî li dûhevbûna wê).

Hetanî eger piştî ewlebûna bingehîn hûn bi koronavayrusê bikevin, em tewsiye dikin derziya xurtbûnê lêdin. Li gor encamên nû, tûşbûn parastina têr dijî nexweşiya giran pêk nayîne. Çar hefteyan piştî tûşbûnê (navbera herî kêmtir a 4 mehan piştî derzîlêdana dawîn a kovîd-19ê berçav bigirin) hûn dikarin derziyê li xwe bidin.

Kîjan vaksîn bo vaksîna xurtkirinê bi kar tê?

Di rastiyê de, girîng nîne kîjan ji van du derziyên mRNA bi kar tê.

Bo kesên jêr 30 salî, xalên jêrê bi kar tên: Li kesên 18 heya 29 salî tewsiye dikin derziya xurtbûnê li xwe bidin û derziya Pfizer/BioNTech terîh dikin. Li kesên 12 heya 17 salî tewsiye dikin derziya xurtbûnê bi Pfizer/BioNTech li xwe bidin. Ji ber vê ku di kesên geêkê kêmtir de werimîna masûleyên dil yan pêrikardiyomê demildest piştî derzîlêdanê rûdide. Ew piştî lêdana derziyê bi Modernayê hindikî ji Pfizer/BioNTech hatin dîtin. Ev bandoreke gelekî kêmtir a kêlekê ye û dikare baş were dermankirin. Werimîna wisan jî dikare piştî pêketina koronavayrusê rûbide. Lê, bi her du derziyên mRNA, sûda

lêdana derziya Kovîd-19ê ji metirsiyên wê yê nihênî pirtir e, hetanî bo kesên jêr 30 salî.

Li ku dikarin vaksînê lêdin?

Kanton berpîrsên vaksînkirinê ne. Li malperê yan Xeta zanyariyan (Infoline)ja kantona xwe binêrin (www.foph-coronavirus.ch/cantons) ku bizanin li ku dikarin navnivîsî bikin û vaksînê lêdin. Yan ji bijîşk, dermanfiroşê xwe yan dermanfiroşiyê bipirsin.

Derziya xurtkirinê ya zêde bo kê tê tewsiyekirin (piştî ku derziyeke xurtkirinê berê dabîn)?

Niha, derziya xurtkirinê ya zêde bo hemû wan kesan tê tewsiyekirin ku ji 80 salî jortir in. Em derziyeke xurtkirinê ya zêde jî bo wan kesan tewsiye dikin ku pergala wan ya ewlebûnê gelekî lawaz e (ji ber nexweşiyê yan dermanan) – bo wan kesan, ji kerema xwe biçin bal bijîşk.

Derziyeke din ya xurtkirinê dikarin ji 4 mehan piştî derzîlêdana dawîn lêdin. Ew parastina derzîlêdanê dijî nexweşiyê giran dîsan zêde dike, herî kêmtir heya demekê.

Gelo ji wextê derzîlêdana xwe ya dawîn hûn bi koronayê ketine? Ji ber ku vê tûşbûnê bi awayê girîng parastina we dijî nexweşiya giran zêde nekiriye, em tewsiye dikin derziyeke din ya xurtkirinê li xwe bidin. Hûn dikarin ji destpêka 4 hefteyan piştî tûşbûnê (navbera herî kêmtir a 4 mehan piştî derzîlêdana dawîn a kovîd-19ê berçav bigirin).

Zanyariyên bermayî bo vaksîna xurtkirinê û vaksîna ewlebûna bingehînê yek in û hûn dikarin wan di vê faknameyê de bibînin «Zanyariyên giştî ser vaksînlêdana Kovîd-19 bi vaksîneke mRNA».

¹ Li steya berfireh a nexweşiyên dikarin li vir bibînin: *bi taybetî jî komên nifûsê yê bêparastin (PDF, 205 kB)*

